# PÊVAJO Û R'OJEVA K'URDÎ – K'Î WAN ÇAWA DIBÎNE Û TÊDIHÎJE!

**(Li dû hinek helwest û dîtinên xwendevanan)**

*"... Ne dostên me yên hert'imî hene, ne jî – dijminên me yên heta-hetayê, her-t'enê berjewendîyên me hert'imî û bêdawî ne, û erk'a me jî ew e, ku wan bip'arêzin!"*

Lord Palmêrston[1]

Dem baş, xwendevanên hêja!

Piştî gotara ya "Newroza azadîyê, pêvajoya aştîyê, astengî û xeterên li ser r'êya wê û çend têbînî"[2] demek a xurt bihurye. Û di vê navberê da gelek p'eyam û name gihîştine ber destê me. Xudanên wan nêr'în û dîtinên xwe di derbarê pêvajoyên Welêt û herêmê da dinivîsin û hest û helwest û dîtinên xwe tînin zimên... Ew dipirsin, daxwez dikin, dixwazin bizanibin, k'a ev bûyerên ku pêk tên, ji hêla dewletê va çima wisa berovajî tên têgihîştin, k'a mirov çawa dikare bi heşmendî wan têbigihîje, r'ave û wat'edar bike...

Weha, Besar Akbaş ji Erziromê digazine, k'a çima piştî gotara navborî em tiştekî nû nanivîsin û dipirse, gelo êdî tiştekî me yê gotinê nemaye?

Not û awazên vî r'engî wisa jî di p'eyamên xwendevanên me Elî Simoyî (Almanîya), Serdar Basî (Kanada) û Gulistan Karabûlûtê (Ankara) da tên bihîstin...

Helbet, ji bo wê, ku xwendevanên me pêvajoyên Welêt û herêmê bi baldarî dişopînin û helwestên xwe tînin zimên, em dilxweş in û r'êzên xwe dyarî wan dikin.

Piştî xwendina van û nameyên dinê yên xwendevanan, me gotarên xwe yên di derbarê pêvajoyê û bûyerên vê serdemê da jinûva li ber ç'avan r'a derbaz kirin, careke dinê ji hêlên cudava r'amanên xwe ji hev vebijartin, û, weha, bi vê boney meyê çi bigota:

– Hûn dizanin, xwendevanên hêja, divê berê pêşin bê zanîn, ku di jîyanê da morov di derbarê hinek bûyeran da çi û çiqasî jî binivîse, hert'im tiştek dimîne, yê ku hê pêdivîya xwe bi makkirin, şirove, r'ave û wat'edarkirinê hene. Ango, hert'im jî tiştek dimîne, ku mirov bibêje, lê her tişt dema xwe û sînorên xwe hene. Helbet, dema em li vira *sînor* dibêjin, mabesta me ne ew sînor in, ên ku ji derva hatine, an tên danîn, lê sînorên xwe yên hindur'în. Wek ku em têdigihîjin, divê mirov bizanibe, k'a k'engê û li k'u çi bibêje. Û ya sereke jî ew e, ku mirov ne bik'eve r'ewşa xwedubarekirinê, ne jî bi neç'arî, ji bo xatirê tiştek gotinê, an nivîsînê, konspîrogîyê va mijûl bibe...

Jixwe, yên ku nûçeyên r'ojane ra'digihînin, hene, hinek jî bûyerên r'ojane dinirxînin û şrove dikin, û ew hemû jî k'arên pêwîst û kêrhatî ne, û dik'evin xizmeta pêkhatin û şêwazgirtina nêr'îna civakî.

Helbet, em jî, mîna hemûyan pêvajoyê û bûyeran bi baldarî dişopînim, heya ku, ...

Û vê carê jî, dema me dît, ku pêwîstî bi lezandinê nîne, ku pêvajo dimeşe, ku em divê wê bişopînin û ç'avdêrîyên xwe bi baldarî bidomînin, em careke dinê veger'yan ser hinek k'arên xwe yên nîvcî mayî – ser nirxandinên pirsgirêkên zimanê k'urdî, r'astnivîsîn û

[1] *Palmêrston, Hênrî Con Têmpl* – salên 1855–1865-an Serokwezîr, lê berî wê – wezîrê p'arastinê û yê k'arên derva yê Anglîyayê bûye.

[2] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/NEWROZA_AZADÎYÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_ASTENGÎ_Û_XETERÊN_LI_SER_R_ÊYA_WÊ_Û_ÇEND_TÊBÎNÎ

r'astaxavtinê. Lewra ku, ji bilî k'arên r'ojnamegerîyê, nivîsk'arîyê û şirovegerîyê, û ji wan jî ne kêmtir, r'aman û mitaleyên me bi zimanzanîyê û pirsên dîroka kevnar va gîro ne. Ev ji bo me bûye tiştekî mîna r'ewşek a xwezayî ya r'amanî û r'ewanî...

Berî r'ûdana bûyerên Sûrîyayê û dengvedana Banga r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan a 27-ê sibata îsal di cîhanê da di destê me da gotarek di derbarê pirsgirêkên zimanê k'urdî da habû, û me ew hema-hema gîhandibû asta berî weşandinê, lê bi destpêka vê pêvajoyê r'a me ew gotar li hêlekê danî û pêvajo û bûyer şopandin, ew bi hûrbînî nirxandin û dîtinên xwe di wê darbarê da nivîsîn û bi we r'a p'arvekirin...

Û gotar-nirxandinên me yên di derbarê pêvajoyê da jî, ji hêla gelek xwendevanan va hatine şopandin, hinekan ji wan jî nêr'în û helwestên xwe ji me r'a şandine – spas ji bo wan hemûyan!

Û gihîşt demekê, me dît, ku hema di vê navberê da, li ser asta îroyîn, ji bilî wê, ya ku me êdî nivîsye, dijwar ku em tiştekî nû bibêjin, lewra ku me, wek r'êgez, nêr'în û dîtinên xwe yên bingehîn di derbarê Pêvajoyê û bûyerên pêkhatî da anîne zimên (û di vê derbarê da çar gotar-nirxandinên me li holê ne, û kesên ku bixwazin wan bixwînin, jêderkên wan dê di dawîya vê gotarê da bên danîn!), jixwe pêvajo dimeşe, emê jî wê bişopînin. Û em bi bawer in, ew dem jî ne dûr e, dema ku dê pêwîstîya gotineke nû derê holê ...

Lewra jî me dît, ku dê r'ast be, eger hema naha, di vê navbera biçûk da, em careke dinê veger'in ser wê gotara xwe û wê bibin sêrî...

Û îro êdî ew gotar hatye weşandin, gelekan ew xwendine, û, eger dîsa hinek bixwazin wê bixwînin, fermo, ewana dikarin wê barbikin[3] û piştî xwendina van nirxandinan li wê veger'in. Lê, eger hinek di derbarê wê da wisa jî nêr'în, pêşniyar, an r'exneyên xwe ji me r'a binivîsin, emê spasdarê wan bin...

Û, di vê navberê da, dema me gotara nîvcîmayî ji bo weşanê şêwazdar dikir, pêvajoyê gav bi gav ji bo aştî û dêmokrasîyê r'ê û r'êbazên ç'areserîyê vedikirin, her çiqas r'êjîma K'T' her tiştî dike, ku ew neçe sêrî...

Lewra jî, ji bo ku ev pêvajo bi hemû t'erefên xwe va bê têgihîştin û wat'edarkirin, wisa jî girîng e, ku helwest û dîtinên xwendevanan bên nirxandin û têgihîştin!

Weha, R'odîyar Şehrêzûrî ji Silêmanîyê û Bazîd Serhed ji Qersê Konfêransa Yekr'êzî-ya K'urdan a R'ojavayê K'urdistanê li gelê me pîroz dikin, û dibêjin, ku Erdoxan û r'êjîma wî ya faşîst li dijî wê derdik'evin, lewra ku dizanin, yekîtya k'urdan tê wat'eya mirina faşîzmê, ku konfêranseke wisa jî dikaribû li Bakûrê K'urdistanê jî pêk bihata, û di wê da k'urdên Bakûr bi yekdengî doza mafên xwe yên net'ewî bikirana...

Ew wisa jî pêşniyar dikin, ku di parç'eyên K'urdistanê yên dinê da jî konfêransên vî r'engî bên lidarxistin, ên ku dikarin bibin bersîv ji siyaseta mêtîngerîyê ya dagerkeran, û k'urdê xwe ji bêr'ûmetîya bindestî û bêmafîya sedê salan r'izgar bikin...

Helwestên vî r'engî di p'eyamên xwendevanên dinê da jî hene, û, wek ku tê xuyan, evê pêvajoyê di nava wan da hêvîyeke mezin hişyar kirye, lewra ku ew bi bawer in, ku gelê k'urd dê her bi r'êya avakirina Yekîtîya Net'ewî xwe r'izgar bike û bigihîje Azadîya Mezin...

Nameyek a t'uje hest û r'aman û hêvî jî ji R'ojilatê Welêt hatye.

Xwendevana me ya hêja, Medya Cemşîdî ji bajarê Hemedanê dinivîse, ku *ew vê pêvajoyê û bûyerên herçar p'arç'eyên Kurdistanê û cîhanê dişopîne, ku ewê çend gotarên me jî xwendine, ku ew dilxweş û serbilind e, ku bi banga R'êberê Net'ewî bir'êz Ocalan gelê me îro li dora R'ojavayê K'urdistanê dibe yek, lê ji hêleke dinê va jî, ew bi dilêşî dide zanîn, ku li ser bûyerên R'ojhilatê K'urdistanê di nava r'ewşembîr, r'ojnameger û şirovegerên me da dengekî lewaz û nerm tê bihîstin. Ku heman lewazî di çapemenî û têlêvîzîonên me da jî tê xuyan... Jixwe dewletên gewre û maldarên vê cîhanê li dû berjewendîyên xwe yên r'ojane ne, t'u k'arekî wan bi pirsgirêkên me nîne.*

[3] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/PIRSGIRÊKÊN_ZIMANÊ_K_URDÎ_V

*Bala xwe bidinê, – ew bi xemgînî didomîne, – dema Seddam t'evkujîya gelê k'urd pêk tanî (Enfal), dema ewî ç'eka k'îmyewî li hember Helebceya p'ak'rewan k'ar tanî, ne di cîhana îslamê da, ne jî ya xrîstîanîyê da dengek ji dewletên gewre derneket, lê, dema wan pêwîst hat, Seddam û r'êjîma wî ya zulmê bir'ûxînin, bi hêsane sedem dîtin (r'asttir dibe, mirov bibêje – hinartin!) ... Û, dema îro r'êjîma tarîp'erestên sedsalên navîn di Îranê da li hember gelê k'urd têr'ora dewletê bi hemû r'engên xwe va dimeşîne: r'ojane keç' û xortên me darve dike, nahêle, ku gelê me ç'avê xwe veke, azad bêhnvede, dengek ji dewletên gewre dernayê, kesek nabêje, ku ev r'êjîm li dijî mirovahîyê sûcê giran pêk tîne, lê bi dengekî berz û bilind behsa ç'eka nûklerî dikin, a ku r'êjîm dixwaze û hewl dide, çê bike – dîsa bi alîk'arîya heman dewletên gewre!...*

*Ev cîhana k'edxwaran e, li k'u her tişt tê k'ir'în û firotin! Lê em? Lê cîhana me – a k'urdan li k'u maye?!*

*Heya em nikaribûn beşdarî Konfêransa yekr'êzîya net'ewî ya R'ojavayê K'urdistanê jî bibin. Û kesek napirse – çima?*

*Ez dibêjim, û ez hêvîdar im, ku dê r'ojekê konfêransên vî r'engî – konfêransên yekr'êzîya net'ewî li R'ojhilatê K'urdistanê, li Bakûr û Başûr jî pêk bên, û piştî wan k'urdên herçar p'arç'eyên K'urdistanê û yên derveyî Welêt jî dê li hevdu bicivin û bi yekr'êzî, bi yekdengî derên pêşîya cîhanê û r'êyên ç'areserîyê ji vê bêdadîyê r'a bibînin...*

Belê, bi zarê te daxwez û hêvîyên gelê me tên r'agîhandin, Medya Cemşîdî, xwîşka hêja! Û ya girîng jî ew e, ku ew hemû, ji Hemedanê – Êkbatana p'ayt'exta Medya kevnar dertê, ji wî bajarî, yê ku Zerdeşt P'êxember têda ç'avê xwe vekirye, wek pê'xember pêk hatye û bîrûbawerîya xwe dîyarî mirovahîyê kirye, ji navenda şaristanîya gewre û mirovhez, ji welatê lehengan, serleşker û r'êvebirên şareza û avak'aran, ji welatê zane û mitaledaran, ji welatê bîrewar, hunermend û helbestvanan...

Belê, tu r'ast dibêjî, di her p'arç'eyekî K'urdistanê da, ya ku îro mêtîngehek a navnet'ewî ye, bêdadî, qedexe, t'evkujî pêk tên, lê r'ewşa R'ojhilatê Welêt t'aybet û awart'e ye... Li vira, bê dengvedaneke mezin, me, wek net'ew, bi r'êzê – yek bi yek darvedikin û bi vê t'evkujîya bêdeng hewl didin, ku nivşên dihatûyê ji bo xwe ç'avtirsyayî kedî bikin.

Lêbelê, dibe ku ewana nizanin, *gelê ku nexwaze bimire, hîç kesek nikare wî bikuje*!

Ev yek jî, gelê k'urd êdî di dîroka xwe da îzbat kirye!

Û ew r'oj jî ne dûr e, ku di asîmanê R'ojhilatê K'yrdistanê da jî dê R'oja Azadîyê hilê û r'onahîya xwe bibe t'evahîya Welêt...

Lê Fata Mûsa ji Bakûrê K'urdistanê, ji Hekkarîyê dinivîse, ku *ew ne ku t'enê bûyeran dişopîne, lê bi xwe jî di nava wan da dijî, û hemû bûyer li dora wê û li ber ç'avên wê pêk tên. Ew dinivîse, ku ewê hinek gotarên me xwendine, ku di yekê ji wan da ewê di derbarê banga R'êber Apo da şiroveyek xwendibûye, û wê demê ew bi wê heşmendî hatye xuyan, lê ew tê nagihîje, çima hê jî hinek bi israr behsa ç'ekberdanê dikin, lê kêm kes dibêjin, ku ç'ek berdan nayê wê wat'eyê, ku ev r'êjîma faşîst a Erdoxan-Baxçelî dê wek xwe bimîne, û gerîlayên r'izgarîya net'ewî jî, dê ç'ekên xwe bibin û r'adestî wan bikin, ...*

*Çawa dibe?*

Helbet, wek prênsîp, xwendevana hêja, Fata Mûsa, pirsê r'ast têdigihîje, û helwesta wê jî li hember têgihîştina pirsê r'ewa û r'ast e.

Eger tê bîra xwendevanên me, hema piştî Banga r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan di gotar-nirxandina xwe ya "R'ojeva k'urdî ya cîhanê, pêvajoya aştîyê û pêşk'evtinên Sûrîyayê!" da em li ser vê pirsê r'awestyabûm û me ew r'avekiribû. Weha, bala xwe bidinê, li wir çê tê gotin: "Di nava civaka k'urdî da jî li hember vê bangê helwestên cuda r'û dane, yên ku li ser asta hestyarî ava bûne (çiqas mirov, ewqas nêr'în – her yek cîhanê wek xwe dibîne!), di vê derbarê da di medya civakî da govtûgo û gengeşîyên cuda pêk tên. Û ya sereke jî, ya ku di Bangê da zêde bala wan vediger'andye ser xwe, ev gotin in: *"... hûn jî bi dildarî kongrêya xwe bicivînin, bir'yaran bigirin, divê hemû k'om ç'ekên xwe daynin, û Partîya K'arkerên K'urdistanê (PKK) xwe fesih bike"*. – Bi r'astî jî, dema mirov t'enê, cuda, derî

kontêk'stê  wan gotinan dixwîne, yan dibihê, dixwaze bipirse: "Çima?! Çawa?! Ma, wisa dibe?!" – . Lê bala xwe bdinê, berî van gotina çi heye: *"Wek ku her civak û partîyek a hemdemî, ku hebûna wê bi darê zorê nehatye dawîkirin, ..."* – ango bi darê zorê, t'u hêzek nikare PKK-ê dawî bike!

Ev yek!

A dinê, bala xwe bidinê, hê berî van gotinan bir'êz Ocalan çi dibêje: *"...R'êzgirtina nasnameyan, azadîya r'amanê, r'êxistinbûna dêmokratîk, avakirina civakî, aborî û siyasî ya hemû pêkhatîyan t'enê bi hebûna civak û qada siyasî ya dêmokratîk dikare hebe.* ***Sedsala k'omarê ya duyemîn t'enê, dema ku bi dêmokrasî bê t'acîdarkirin, dikare bibe xwedî yekîtî û berdewamîyeke mayînde.*** (Bi t'aybet bala xwe bidine evê hevokê! – E. C.). *Ji dêmokrasîyê pêva t'u r'eyeke dinê ya lêger'îna p'ergalan û pêkanîna wan nîne, ne mumk'ên e..."* – Û ev jî p'eyamek e, hem ji bo r'êvebirîya T'irkîya îroyîn, ji bo ku veguhar'tinan pêk bîne û merc û derfetên pêwîst biafirîne, hem jî ji bo r'êvebirîya PKK-ê, ji bo ku anegorî van mercan t'evbiger'e û gavên pêwîst biavêje!" [4]

Û, wek ku tê xuyan, r'êvebirên r'êjîmê ev yekê ji hinekên nava me çêtir têdigihîjin, ku ç'ekberdan nayê wê wat'eyê, ku dê PKK yekalî ç'ekên xwe bibe û r'adestî vê klîka faşîst bike. Na! Ji bo vê merc hene, û ew jî hem di Banga R'êber Apo da, hem jî di daxwîyanîyên R'êvebirîya T'evgera Ne'tewî ya R'izgarîxwaz da hatine gotin, ew jî, wek ku li jorê jî hate gotin, ev e: *"...R'êzgirtina nasnameyan, azadîya r'amanê, r'êxistinbûna dêmokratîk, avakirina civakî, aborî û siyasî ya hemû pêkhatîyan t'enê bi hebûna civak û qada siyasî ya dêmokratîk dikare hebe.* ***Sedsala k'omarê ya duyemîn t'enê, dema ku bi dêmokrasî bê t'acîdarkirin, dikare bibe xwedî yekîtî û berdewamîyeke mayînde.*** (Bi t'aybet bala xwe bidine evê hevokê! – E. C.). *Ji dêmokrasîyê pêva t'u r'eyeke dinê ya lêger'îna p'ergalan û pêkanîna wan nîne, ne mumk'ên e..."* – Û ev tê wê wat'eyê, ku r'êjîm bi xwe jî divê bê guhar'tin, divê dewlet dêmokratîk bibe, K'T' bibe dewleta hemû pêkhatîyan, û li wir mafên hemû gelan bi destûrî weke hev bin, divê ewlehîya her kesekî, k'omekê, civakekê, gelekî bi destûrî bê misogerkirin, ango, bi destûrî ç'ek û hemû sazî û p'ergalên cezak'ar (*repressive*) di bin kontrola gel da bin, ji bo ku hîç sewdaserekî wek evên îroyîn nikaribe, art'êşê li dijî gelê medenî k'ar bîne, gund û bajarên wan wêran bike, t'evkujîyan pêk bîne, bê ser û ber siaysetmeder û çalakvanên civakî bigire û bavêje hebsan (îro di girtîgehên K'T' da derdorê 15 hezar girtîyên k'urd ên siyasî hene!), ku hîç sazîyek a dewletê, an r'ayedarek (ew k'î jî dibe, bila bibe!) nikaribe dest dayne ser şaredarîyan, r'êvebirên wan, ên ku bi dengê gel hatine hilbijartin, bavêje hebsan û li şûna wan mirovên xwe p'eywirdar bike...

Dibe ku hinek bibêjin, ku Erdoxan û Baxçelî evê yekê tê nagihîjin! – Hûn bawer dikin?

Lewra jî, ewana wisa bi bir'yar her tiştî dikin, ku ev pêvajo neçe sêrî, ji ber ku ew bi şêwazekî dinê nizanin û nikarin bijîn û r'êvebirîya wî welatî pêk bînin. Eger wan bixwasta, ku ev pêvajo her'e sêrî û aştî pêk bê, dê ev êrîşên ser herêmên gêrîlayan pêk nenyana, dê li dijî wan ç'eka k'îmyewî k'arneanyana! – Belê, belê, eger têgihîştin û daxweza ç'areserîya pirsê li bal wan hebûya, wek mirovên şaristanî, wan dê bir'êz Ocalan û hemû girtîyên siyasî azad bikiriana, dê bi wî r'a bik'etana nava dîalogê, û ewî dê ji sedî-sed r'êyên ç'areserîyê nîşanî wan bida...

Lêbelê, mixabin, ew zimanê aştî û dêmokrasîyê nizanin, lewra ku ev k'omar, a ku ji derva, bi destê dewletên gewre ên mêtînger, bi navê T'irkîya bi sûnî hatye hinartin, ne ji bo wê bûye, ku mafên r'ewa yên gel û net'ewan di wê da bên misogerkirin. Ew p'arç'eyekî mêtîngerîya navnet'ewî ye, û evên ku îro T'irkîyayê r'êve didibin, ji bo wê hatine p'erwer-dekirin û gîhandin, ku ew berjewendîyên wan bip'arêzin, wekî dinê ew serbest in, çi ku bixwazin, dikarin wê jî pêk bînin ... Ji ber wê jî, heya ev sîstêm heye, heya ev peyayên wê sîstêmê li ser desthilatê ne, dê di wî welatî da hîç gavek jî berbi dêmokrasîyê va neyê avîtin!

[4] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_OJEVA_K_URDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_PÊŞK_EVTINÊN_SÛRÎYAYÊ

Û, lewra jî, di vê r’ewşê da divê pirsgirêk ji nava derdorên teng a r’êvebirîya r’êjîmê bê derxistin û di nava civaka T’irkîyayê ya berfirehtir da, di meclîsa wê da, heye li ser asta navnet’ewî û navdewletî bê goftûgokirin, ç’avê cîhanê li ser r’astîyan bê vekirin (divê bê zanî, mêtîngerîya navnet’ewî jî êdî ne ya destpêka sedsala XX e, îro êdî gelek konyûnktûrên navdewletî hatine gihar’tin!)...

Û r’êberê gelê k’urd bir’êz Ocalan jî bi Banga xwe ya 'Aştî û Civaka Dêmokratîk' êdî destpêka vê pêvajoyê danye. Û di vê pêvajoyê da r’ola civaka berfireh ya r’ewşenbîran, ya sazî, r’êxistin û k’omeleyên civakî, afrandarî, hunerî, ya medyayê p’ir’ girîng e, ji bo ku ç’avê civaka navnet’ewî li ser r’astîya pirsgirêka k’urdî, astengîyên li ser r’êya ç’areserkirina wê vekin. Wisa jî girîng e, ku di nava çarç’oveya vê pêvajoyê da ç’avê civaka cîhanê li ser r’astîya vê r’êjîmê bê vekirin.

Û ji bo wê jî li ser asta navnet’ewî êdî bingehek hatye danîn.

Bala xwe bidinê, hê cotmeha sala 2019-an dozgera berê ya Dadgeha navnet’ewî (*International Tribunal*) ya R’êxistina Net’ewên Yekbûyî (R’NY/UN) ***Kar’la dêl Pontê*** bang kiribû, ku Erdoxan di Dadgeha Haagayê da darizînin. Di banga wê da bi t’aybet dihat gotin, ku: ***“Erdoxan xaka Sûrîyayê dager kirye, ji bo ku k’urdan t’une bike. Ev nayê p’ejirandin! Divê li hemberî wî lêpirsîn bê destpêkirin. Erdoxan divê ji bo pêkanîna sûcên leşkerî bê darizandin. Divê destûr neyê dayîn, ku ew ji wî r’a bimîne. K ’urdên Sûrîyayê û T’irkîyayê di bin t’ehdîd û metirsîyên ciddî yên r’êjîma Ankarayê da ne”.***[5]

Û ya here girîng! Dadgeha bilind a bir’yarguyêr’ a Bêlgîyayê 28-ê r’êbendana sala 2020-î di Brûk’sêlê da di wê derbarê da bir’yar erê kirye, ku ***Partîya K’arkerên K’urdistanê r’êxistineke têr’orîstî nayê hejmartin, lê wek t’erefekî p’evçûnên ç’ekdarî tê dîtin...***[6]

Û, ya dinê, 10-ê cotmeha sala 2020-î wek R’oja têk’oşîna ji bo Azadîya R’êber Ocalan hatye r’agîhandin.

R’êzek r’ayedarên navdar ên siyasî li seranser Ewropayê (ji Welatê Baskan heya Brîtanîya Mezin!) p’eyamên xwe yên vîdêoyî şandibûn, û di wan da bang kiribûn, ku dawî bi goşangîrîya (t’ecrîd) bir’êz Ocalan bê anîn.

Lê, endama Baskê Jorîn ê Parlamêntoya Brîtanîyayê (Seraya lordan), nûnera lêyborîstan û hevseroka T’avgera “Azadî ji bo Ocalan” *K’rîstîn Blowêrê* daxwîyandibû: ***“Em piştgirîyê didin wan, ên ku banga azadîya Ocalan dikin, lewra ku em bi bawer in, heya Ocalan cîyê xwe yê ji hêla hemû mafan va misoger negire, pirsgirêka k’urdî dê ç’areser nebe”.***[7]

Ev – ji bo têgihîştin û wat’edarkirina pirsgirêkê bi giştî!

Di vê derbarê da xwendevan dikarin bi hûrbînî di gotara “R’ojeva k’urdî ya cîhanê, pêvajoya aştîyê û pêşk’evtinên Sûrîyayê!” da bixwînin.[8]

R’êvebirîya T’evgera Net’ewî êdî bersîva Banga R’êberê Gelê K’urd bir’êz Ocalan daye û ji bo pirsgirêka k’urdî bi aştyane bê ç’areserkirin, amade ye, kongrêya xwe pêk bîne, lê r’êjîm êrîşên xwe li ser hêzên gêrîla didomîne, heya li dijî wan ç’eka k’îmyewî k’ar tîne. Ango, r’êjîm bi wê yekê dide zanîn, ku ew naxwaze, û ne amade ye, ku pirsgirêkê bi aştyane ç’areser bike. Û ev jî bi heşmendî tê têgihîştin: ev r’êjîm ne ya avakirinê û ç’areserîyan e, ku heya ew li ser desthilatê be, di K’T’ da dê t’ucar aştî nînbe...

---

[5] https://eadaily-com.turbopages.org/eadaily.com/s/ru/news/2019/10/27/karla-del-ponte-prizyvaet-sudit-erdogana-v-gaagskom-tribunale

[6] https://anfrussian.com/Новости/Вердикт-бельгийского-суда-в-отношении-РПК-может-стать-прецедентом-18379; см. также: «Дело РПК в суде Бельгии прекращено». – https://anfrussian.com/Новости/Дело-РПК-в-суде-Бельгии-прекращено-17949 и «Рим выступает за свободу Оджалана» – https://anfrussian.com/Новости/Рим-выступает-за-свободу-Оджалана-8797.

[7] https://anfrussian.com/Новости/От-страны-басков-до-Великобритании-в-поддержку-Оджалана-24582

[8] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_OJEVA_K_URDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_PÊŞK_EVTINÊN_SÛRÎYAYÊ

Lewra jî, dê r'ast bibûya, eger sazî û r'êxistin û k'omeleyêm me yên civakî, wek pêngav û hewlek a sivîl, ji bo ç'areserîya pirsgirêka k'urdî înîtsîatîva xawe k'arbanyana û li ser bingeha wan agahîyana, yên ku me li jorê anîne, berbir'î Dadgeha Navnet'ewî ya Haagayê bibûna, ji bo ku ew pirsa sûcên giran ên r'êjîma faşîst a Erdoxan-Baxçelî, yên ku ewê li dijî gelê k'urrd (bixwîne: *li dijî mirovhayê!*) pêk anîne, bike r'ojeva xwe û bibihê.

Û ji bo pêngaveke weha (eger ew demekê pêk bê!) hê *28-ê mijdara sala 1999-n, neh mehan pey bi korsanî girtina r'êberê gelê k'urd bir'êz Abdullah Ocalan r'a* me *di gotara "Pisgirêka k'urdî. ...Cîhanê ji bo ç'areserkirina wê çi r'êyan pêşnîyar bike?" da ev wêneyê Dadgeha navnet'ewî ya Nyûrinbêrgê, bi van gotinên jêrê va danîbû:*



**Dadgeha navnetewî ya Nyûrnbêrgê (1945 – 1949). Ji bo pêkanîna sûcên giran li hember mirovahîyê syasetmeder, serleşker û serekfermandarên Almanya faşîst hatin darizandin. Lê kengê, gelo, ev dadgehê careke dinê berev bibe û ji bo sûcên giran, ên ku wan li dijî mirovahîyê pêk anîne, rêvebirên Tirkîyaê jî bên darizandin?**

*... Ji wê demê û virva êdî zêdetirî 25 salan bihurîne, lê ew pirs hê jî di heş û sewda, r'ewan û r'amanên me da bê navber dubare r'ûdidin: "Dê k'engê, gelo, dadgeha Nyûrn-bêrgê jinûva berev bibe, û vê carê r'êvebirên T'irkîyayê ji bo wan sûcan darizîne, ên ku wan li dijî mirovahîyê pêk anîne?"*

*Û ji bo ç'areserîya pirsgirêka k'urdî jî, ji navê t'erefê k'urdî yê dozxwaz me di dawîya gotarê da çend pêşnîyar-xal danîbûn...* Ev hemû, bi t'evahîya xwe va, di p'irtûka "Abdullah Ocalan. Ramana azadîyê, gelê kurd û cîhan" da hatye weşandin (r'û.: 20 – 30).[9]

Û, wek ku em dibînin, mirov dikaribû wisa jî ew sûcên ku klîka Erdoxan-Baxçelî li dijî gelê k'urd û t'evaya gelê T'irkîyayê û herêmê pêk anîne, li wan xalan zêdebikira û ew ji navê sazî, k'omele û r'êxistinên sivîl pêşk'êşî R'êxistina Net'ewên Yekbûyî bikira...

Ev pêwajo bi çi şêwazî jî bi encam bibe, heya, eger ev r'êjîm werguhêr'î p'ergaleke r'êvebirya gel (dêmokratîk) jî bibe, yek e, ji bo dersên dîrokê, ji bo ku mirovahî ji wan dersan derxe, ji bo ku careke dinê hinek sewdaserên dinê li hember mirovahîyê bi k'arên vî r'engî

[9] https://amidakurd.net/ku/tekst/ABDULLAH_OCALAN_Ramana_azadîyê_gelê_kurd_û_cîhan ; di vê derbarê da hûn dikarin wisa jî li vira bixwînin: https://www.Ami dakurd.net/ku/tekst/R_EWŞA_SÛRÎYAYÊ_PIŞTÎ_TÊKÇÛNA_R_ÊJÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_URDÎ_Û_R_ÊYÊN_Ç_ARESERÎYA_WÊ

r'anebin, divê dadgehek a weha pêk bê, û dema bir'yardanê ew xalên ku me pêşnîyar kiribûn, bingeh bên girtin, helbet, wisa jî sûcên ku vê serdema dawîyê da ji hêla r'êvebirên K'T' va hatine pêkanîn, li wan bên zêdekirin û nirxandin...

Û dema em li dû van r'aman û mitaleyên xwe bûn, me digot, gelo, di r'ewşeke weha da, r'êjîma T'irkîyê dê êrîşên xwe r'awestîne, ji bo ku PKK bikaribe kongrêya xwe lidarbixe, em (û ne t'enê em!) hema-hema bêhêvî bibûn, ku di vê r'ewşê da dijwar pêkan be, ku kongrê pêk bê, 9-ê gulanê hate r'agîhandin, ku r'ojên 5–7-ê gulanê di Herêmên P'arastinê yên Medyayê da Kongrêya XII a PKK pêk hatye...

Bi r'astî, vê carê jî PKK hemû t'eref matma hiştin û hemû hewlên r'êjîmê, ku nehêle kongrê pêk bê, vala derxistin. Bi vê yekê PKK careke dinê da xuyan, ku ew bi r'êberê xwe r'a ye û amade ye, hemû bir'yarên wî pêk bîne, lewra ku heya dawîyê bawerîya wan bi r'êya wî heye, û ew dizanin, ku her bir'yarên wî dikarin r'ê li pêşîya aştî û dêmokrasîyê vekin û ji T'irkîyayê, K'urdistanê û t'evahîya herêmê r'a aramîyê bînin.

Di weşanên r'ojane û bernameyên têlêvîzîonî yên t'aybet da Kongrêya XII a PKK bi berfirehî hatye û tê govtûgokirin, biryarên wê tên nirxandin û r'onîkirin, axavtinên endamên r'êvebirîya PKK-ê û beşdarên Kongrê hem bi dîmenî, hem jî bi nivîskî tên weşandin ... Bi zarê wan r'astîya r'ewşa herêmê, pêvajoyê û helwestên li hember wê dertên ber ç'avan...

Helbet vegotin û şiroveyên cihêr'eng jî di derbarê vê pêngava PKK da tên p'arvekirin, lê, ji bo ku ev pêvajo r'ast bê têgihîştin, bi dîtina me, ya r'ast ew e, ku mirov piştî hinek weşanan, heya berî wan jî, şirove û axavtinên r'êvebirên r'êxistinê û beşdarên Kongrê guhdar bike, an bixwîne, ji bo ku bikaribe agahîyên r'astîn ji ç'avkanîyên destpêkî wergire, wan bi heşmendî binirxîne û wat'edar bike ...

An na, îro, r'êjîma faşîst piştî bir'yara Kongrê ya di derbarê bi r'êxistinî xwebetalkirina PKK-ê û r'awestandina şer'ê ç'ekdarî da jî li dijî wê şer'ekî qir'êj û k'irêt dimeşîne...

Bi r'astî, nak'eve heşê mirov – ji bo çi û çima? – Û, eger mirov bersîva van pirsan bibîne, dê têbigihîje, k'a tirsa r'êjîmê ya ji aştîyê ji k'u tê, k'a tiştê ku ew jê ditirsin, çi ye!

Di vê derbarê da me li jorê êdî bi bingehîn, wek r'êgez, bersîva van pirsan daye, lê dîsa jî: bala xwe bidinê, heya naha, ji bo ku ev r'êjîma faşîst xwe li ser p'êyan r'agire, behaneyek pêwîst bû, û ji bo wê jî divê nîgara dijminekî xiyalî bi dest (sûnî) hinartina û ew bikirina armanc, ji bo ku bi hêsane gel bidin bawerkirin, ku têr'or heye û ew li dijî wê ditêk'oşin. Her çendî, hema di destpêkê da ç'avkanîya têr'orê r'êjîm bi xwe bûye – bi Destûra Bingehîn (xala 66.), bi siyaseta înk'arê, qedexeyê, bişavtinê, têr'ora dewletê, t'evkujîyê û t'unekirinê va!

Naha PKK bi bir'yara kongrêya xwe XII ew karta (koz) bi sûnî hinartî ji destê wan derxist, lewra jî ew wisa har bûne... Dîsa behsa bêtêr'orkirina T'irkîyayê dikin, tuyê bibêjî, bi evê sîstêma heyî, bi vê r'êjîma faşîst pêkan e, ku T'irkîya ji têr'ora dewletê r'izgar bibe! Lewra ku, ne pêkan e, ku ç'avkanîya têro'rê bi xwe K'omarê ji têr'orê, ango, ji xwe r'izgar bike!

Û, wek ku di nava gel da dibêjin, kesek nîne, li ser asta navdewletî ji cîhanê r'a bibêje, ku di K'T' da her ç'avkanîyeke têr'orê heye – ew jî r'êjîma faşîst a Erdoxan-Baxçelî ye, ku di vî welatî da her têr'orek heye – têr'ora dewletê, ku derk'etina PKK, wek r'êxistin, ji bo bi siyasî ç'areserkirina pirsgirêka k'urdî bûye, ku r'êjîma T'irkîyayê bi êrîşên xwe yên t'unekirinê PKK neç'arî têk'oşîna ç'ekdarî kiye, ku têk'oşîna PKK li dijî têr'ora dewletê bûye û, ji vê hêlê va ew r'êxistineke antî-têr'orî ya navnet'ewî bûye... Lêbelê, ji ber ku K'T' endama NATO-yê bûye, ewê dikaribûye di nava wê çarç'oveyê da li dewletên emdamên wê ferz bike, ku PKK bikin lîsteya têr'orê...

Hew!

Û piştî vê jî, her çiqas, Dadgeha bilind a bir'yarguyêr' a Bêlgîyayê 28-ê r'êbendana sala 2020-î di Brûksêlê da bir'yar erê kirye, ku ***Partîya K'arkerên K'urdistanê r'êxistineke têr'orîstî nayê hejmartin, lê wek t'erefekî p'evçûnên ç'ekdarî tê dîtin***[10], û dozgera berê ya

[10] Li nasîya **6.** û **8.** binihêr'in.

Dadgeha navnet'ewî (*International Tribunal*) ya R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY/UN) ***Kar'la dêl Pontê*** cotmeha sala 2019-an bang kiribû, ku: ***"Erdoxan xaka Sûrîyayê dager kirye, ji bo ku k'urdan t'une bike. Ev nayê p'ejirandin! Divê li hemberî wî lêpirsîn bê destpêkirin. Erdoxan divê ji bo pêkanîna sûcên leşkerî bê darizandin. Divê destûr neyê dayîn, ku ew ji wî r'a bimîne. K'urdên Sûrîyayê û T'irkîyayê di bin t'ehdîd û metirsîyên ciddî yên r'êjîma Ankarayê da ne..."***[11], dîsa jî, yek e, sîstêma vê cîhanê weke xwe dimeşe.

De, îjar dibêjin, k'a ev şer' û p'evçûn di vê cîhanê da ji k'u tên!

Helbet, her çiqas, di vê cîhanê da hinek tişt hatine guhar'tin jî, dewletên endamên NATO-yê di nava çarç'oveya têk'oşîna hevpeymanî ya dijî DAIŞ-ê da gelek r'astî li ber ç'avên xwe dîtine û hêzên PKK-ê ji nêzîk va nas kirine, lê ew qalib, ên ku di nava dehê salan da hatine çêkirin, wisa hêsan nayên şkênandin... T'ecrûba dehê salan a têk'oşîna dijî têr'ora dewletê di têk'oşîna dijî DAÎŞ-ê da xwe da xuyan! Lê, dîsa jî, her çendî, tabûyên hember PKK-ê, yên ku bi hewl û ferzên r'êjîma K'T' (wek dewleteke endama NATO-yê) hatine danîn, hê jî dimînin, lê îro êdî heya hinek r'ayedarên dewletên endamên NATO-yê jî tê-digihîjin, ku bi pêkanîna gelek k'aran va ew dibin hevk'ar û hevp'arên wan sûcan, ên ku r'êjîma K'T' a faşîst li dijî mirovahîyê pêk tîne...!

Bi gotinekê, ya ku pêk hatye, êdî pêk hatye, lê ji vir û pêva...?

Helbet. piştî pêkhatina Kongrêya PKK-ê ya XII jî Erdoxan bi peyayên dora xwe va dê daxwîyanîyên berovajî r'astîyan bidin! Û di vê r'ewşê da gelo NATO-yê dîsa wek berê xwe bi bêdengî bibihêre?

Lêbelê, baş tê zanîn, ku ji bilî hevk'arên K'T' ên NATO-yî hîç hêzek dinê nîne, ku bikaribe vê r'êjîmê bîne ser r'ê – hemû derfetên siyasî, aborî û leşkerî di destên wan da hene!...

Û, eger ew van derfetan k'arneynin, dîrokê wan efû neke!

Wek ku êdî hate gotin, piştî vê kongrêya dîrokî karta têr'orê, ya ku r'êjîma T'irkîyayê li dijî T'evgera Azadîyê k'ar tanî, ji destê wê hat derxistin, ji vir û pêva dimîne, ku hêzên navdewletî bi erk'a xwe r'abin û r'êjîmê neç'ar bikin, ku ew ji bo bi aştî ç'areserkirina pirsgirêka k'urdî gavên pêwîst biavêje.

Ya dinê jî, divê tiştek neyê jibîrkirin, PKK di destpêkê da wek r'êxistineke siaysî pêk hatye, paşê ew berfireh bûye û bûye t'evger – t'evgera gel, û evê t'evgerê jî bi xwe r'a net'ewk a nû gîhandye. Eger tê bîra we, di nava gel da wek slogan dihat gotin: "PKK gel e, gel jî li vir e!" – Lewra jî divê bê zanîn, PKK di kongrêya XII da wek r'êxistineke siyasî ya xwedî hêzên leşkerî, xwe betal kirye, lê net'ewa k'urd, wek xwedîya wan nirx û derfetan, ên di nava van pêncî salên dawîyê da hatine afirandin, li holê ye, û ewê bi aktîvî beşdarî pêvajoya veguhêr'în û jinûva vesazkirinê bibe, û, ji bo ku bi serk'êşîya R'êberê Net'ewî têk'oşîna xwe ya ji bo mafên xwe yên mirovî û net'ewî bi r'êyên aştî û dîmokrasîyê bidomîne, dê wan derfetan bike bingeh.

Lêbelê, ji bo ku ev têk'oşîn bi r'êyên aştî û dêmokrasîyê bê domandin, divê di sêrî da r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan û hemû girtîyên siyasî serbest bên berdan, hemû êrîşên r'êjî-mê yên siyasî, çandî, derûnî û ç'ekdarî (têr'ora dewletê!) li hember gelê k'urd bên r'awes-tandin, di Destûra Bingehîn da mafên gelê k'urd û yên hemû pêkyatîyên dinê yên K'omarê bên mosogerkirin, hemû şaredarîyên ku bi korsanî zevtkirî, li gel bên veger'andin...

PKK di dema xwe da (24.01.1995) Peymana Jênêvayê (The Geneva Convention) ya di derbarê p'arastina mafên mirovan a di demên p'evçûnên ç'ekdarî da – leşker, hêsîrên şêr', yên birîndar û kesên medenî, îmze kirye[12], û di wê derbarê da li Jênêvayê di civîna çapemanîyê da r'agîhandye. Lêbelê, r'êjîma T'irkîyayê hîç r'êzik û pîvanek a sazî, r'êxistin û peymaneke navnet'ewî ne dişopîne û ne jî cîh tîne.

Û di vê r'ewşê da ji sazî û r'êxistinên navnet'ewî, û di serî da jî ji R'êxistina Net'ewên

---

[11] Li nasîya **5.** û **8** binihêr'in.

[12] https://www.ozgurpolitika.com/haberi-pkk-1995ten-beri-cenevreye-uyuyor-10455/

Yekbûyî dengek dernek'etye, her çiqas, divê hema wana cîhanîna merc û pîvanên vê daxwîyanîyê bişopandana û, dema ku pêwîst bikira, desttêwerdanek pêk bianyana.

Lewra jî, r'êjîma faşîst ji vê r'ewşê wêrekî girtye, ku siyaseta têr'ora dewletê û t'evkujîyan li dijî gelê k'urd pêk bîne û di ser da jî propagandaya r'eşkirinê ya qir'êj li dijî p'arazvana mafên gel – PKK-ê û t'erefdarên wê bimeşîne. R'êjîmê her tişt kirye û îro jî dike, ku siyaseta xwe ya dijmirovî li civaka cîhanê bide p'ejirandin û ferz bike.

Naha li vira pirs dertê holê: "Em bibêjin, PKK, wek r'êxistin, xwe betal kir, ê, paşê? Eger ji vir û pêva êdî r'êxistinek nemaye, ya ku mercên wan peymanên navnet'ewî cîh bîne, yên ku PKK di dema xwe da binnnûs (îmza) kiribûne, wê demê, eger ev r'êjîm, a ku bi hemû barbarî û têr'ora dewletê va tê zanîn, êrîşên xwe li dijî gelê k'urd bidomîne, dê li dijî wan êrîşan hinek hêzên dinê ji nava gel derên, ên ku bi hîç peymanek a navnet'ewî va girêdayî nînin, wê demê dê çawa bibe?"

Û, eger ev hêzana di têk'oşîna xwe ya li dijî têr'ora dewletê da heman r'êgezan pêkbînin, yên ku dewlet li dijî gel pêk tîne, wê demê, gelo, k'îyê bikaribe wan t'ewanbar bike? Û, yên ku şer'ekî weha bimeşînin jî, t'êra xwe hebûne û îro jî hene, hemma PKK bi hebûna xwe r'ê nedaye, ku têk'oşîna gelê k'urd ji sînorên r'ewa derbaz bibe…

Îro, di vê r'ewşê da, hêzên navnet'ewî, eger ew bi r'astî t'erefdarên aştî û aramîyê ne, divê evê yekê li ber ç'av bigirin, ji bo ku paşê guh nedin r'êjîma faşîst a dagerker û k'urdan t'ewanbar nekin, ku wna ji bo xwep'arastinê bersîv dane êrîşên r'êjîmê û li dijî têr'ora dewletê derk'etine…

Gelê k'urd îro serdema dîroka xwe ya guhartinên mezin û bêhemp'a dijî: eger piştî banga 27-ê sibatê ya r'êberê gelê k'urd bir'êz Abdaullah Ocalan cara yekem pirsgirêka k'urdî li ser astekê bilind navnet'ewî bûye, ji bo ç'areserîya pirsgirêka k'urdî r'êyên aştîyane hatine vekirin, destpêka pêvajoya yekr'êzîya k'urdan hatye danîn, lê, bi pêkhatina kongrêya XII jî, dibe ku, di dîroka PKK da cara yekem r'astîya vê r'êxistinê, dîrok û serdemên têk'oşîna wê ya ji bo mafên gelê k'urd ewqasi bi berfirehî di nava girseyên gel û civaka navnet'ewî da hate dazanin û r'onîkirin …

Û, eger di vê kongrêyê da PKK-ê xwe wek r'êxistin, betal jî kir, lê ew wek nirxekî net'ewî bi şêwazekî dinê, bi wat'eyî vejîyan bû û dê bi vî şêwazê nû (zêde ne girîng e, bi çi navî) dê bi serk'êşîya r'êberê net'wî bir'êz Ocalan têk'oşîna xwe ya ji bo Aştîyê û civaka dêmokratîk bidomîne, lewra ku evî gelî, wek net'ew, bi îdêayên Ocalan çavê xwe vekirye û pêk hatye û dê bi wan îdêan jî bigihîje mafên xwe yên mirovî û net'ewî…

Û di dawîyê da – di derbarê hinek helwestên xwendevanan ên dinê da jî!

Weha, R'izo R'eşo (Qmûşlo/ R'ojavayê K'urdistanê), Hoşyar Badînî (Hewlêr/Başûrê K'urdistanê) û R'êvazê Barî (T'bîlîsî/Gurcistan) r'exneyên xwe tînin zimên, *k'a çima em hemû di derbarê r'ewşa Başûrê Kurdistanê û helwest û k'arên r'êvebirîya PDK-ê yên vê serdemê da bêdeng dimînin, tiştekî nanivîsin, k'a dê k'engê dengê me – r'ewşenbîr, r'ojnameger û hunermendan bê bihîstin? Ku ji ber bêdengîya me di Herêma Otonom a Başûrê K'urdistanê da r'ewşeke weha t'evlihev û bi xeter heye, ku, wek ku tê r'agîhandin, PDK-ê 140-î zêdetir baregehên leşkerî-sîxurî yên T'irkîya dagerker anîne li herêmê cîh kirine, ku ewê dema pêkhatina Kongrêya XII a PKK astengî çêkirine, mil bi mil bi hêzên T'irkîyayê r'a t'evger'yaye...*

Ew dixazin bizanibin, k'a, çima di derbarê van bûyeran da her wek nûçeya di derbarê tiştekî di r'êzê da pêkhatî da dibihên, k'a, çima ew *dengekî, nirxandinekê, helwestekê* ji r'ewşenbîrên k'urd nabihên. Û dipirsin – heya k'engê?

Mirov bi vê boneyê dikarbû çi bigota?

Hûn dizanin, dostên hêja, r'ast e, îro di Başûrê K'urdistanê da r'ewşek heye, ya ku navê p'ejirandin, lê ew r'ewş îro t'eze çênebûye û dê bi carekê r'a jî neyê guhar'tin. Divê em hinek tişt di nav dînamîka pêşk'evtinan da binirxînin. Divê hinek tişt bên dîtin. Hema di r'ewşek a weha da r'êvebirîya PDK-ê û ya Herêma Otonom a Başûrê K'urdistanê di pêvajoya têk'ilîdarî Banga R'êberê Net'ewî bir'êz Ocalan da xwe ji hêla erênî va dan xuayn,

lê, wek ku tê xuyan, hinek tişt hene, yên ku ji hêz û karînên wan der in, ewana di dema xwe da bi sedemên cuda ji gelek hêlan va bi r'êjîma T'irkîyayê r'a hatine girêdan. Heya, dibe ku, di nava wan da hinek peyman jî hatibin girêdan. Di derbarê hinek t'erfên vê r'wşê da di dema xwe da hinek nirxandinên me hatine weşandin[13]**.** Bi r'astî, me jî dizanibû, ku ji çilî zêdetir baregehên K'T' bi destûrdana PDK-ê di Herêmê da hatine cîhkirin, û ku ew ne çil in, lê ji sed û çilî zêdetir in, em jî vê dawîuê agahdar bûne. Me ji nûçeyeke Stêrk tv[14] bihîst, ku Bî-bî-sî-ê (BBC) li ser wê belgefîlmek k'işandye. Piştr'a bi alîk'arîya hinek dost û hevalên welatp'arêz wergera t'irkî[15] ya wê fîlmê û nimûneya wê ya bi înglzî[16] gihîştin ber destê me. Û di wê derbarê da jî, ku dema pêkhatina kongrêya XII a PKK ji hêla PDK va astengî hatine derxistin, dîsa em ji têlêvîzîonê agahdar bûn...

Helbet, ev r'ewşa ji hîç hêlekê va nayên p'ejirandin!

Hem jî divê bê zanîn, ku hîç pirsgrêk t'enê ya herêmeke K'urdistanê nîne, her pirsgirêkek dawîya dawîyê bandora xwe li ser çarenûsa t'evaya gel û welatê me dike. Ango, her pirsgirêkek – biçûk an mezin – a net'ewî ye, û, lewra jî, hemû hêz û r'êxisrin, ên ku xwe net'ewî dihejmêrin, divê bi hev r'a li ser pirsgirêkan r'awestin. Ji bo vê di sêrî da divê di nava hemû hêzên k'urd ên siyasî da danûstandin û dîalog hebe, divê ew bi hevr'a pirsgirêkan (yên t'evahîya herêmên Kurdistanê – beş bi beş) binirxînin û r'êyên ç'areserîyê bibînin. Û ji bo vê jî, piştî banga Rêber Ocalan îro merc û derfet hatine afirandin, ku yekr'êzî û yekdengîya k'urdan pêk bê. Piştî konfêransên herêmî divê k'urd êdî di derbarê sazîyeke net'ewîgiştî hewl bidin, wek navendek a net'ewî, navê wê çi dibe, bila bibe, li ku hemû pirsgirêkên gelê me bên nirxandin û ji bo ç'areserîya wan r'ê bên vekirin...

Di vê r'ewşa nû da mirovê bikaribe, gav bi gav hemû pirsgirêkên heyî û yên ku dê nû derên, ç'areser bike.

Di pirsa baregehên KT ên li Başûrê Kurdistanê da jî, hêzên navdewletî, û di sêrî da jî NATO-yê dikaribû r'ola xwe bilîsta... Ma T'irkîya ne endameke NATO-yê ye? Ma art'êşa wê ne art'êşeke natoyî ye? – Helbet! Wê demê, di pirsa derxistina baregehên K'T' ji Başûrê K'urdistanê da NATO dikare r'ola xwe bilîze, bi t'aybet jî piştî Banga Rêber Apo û pêkhatina kongrêya XII a PKK.

Bi banga r'êberê gelê k'urd birêz Ocalan ji bo hemû P'arçeyên K'urdistanê û pirsgirêka k'urdî bi giştî, li ser asta navnet'wî rêyên çareserîyê vedibin ... Her dimîne, ku hemû hêzên k'urdî yên siyasî, sazî, r'êxistin û k'omeleyên civakî, r'ewşenbîrî, çandî û hinerî xwe anegorî û ji bo van guhartinan amade bikin û bi hemû hez û derfetên xwe va beşdarî vê pêvajoyê bibin...

05 – 20. 05. 2025 Pyatîgors/R'ûsîya

---

[13] "R'êjîma baasî Sûrîyayê k'et – ev dawî bû, an – destpêka nû?!" – https://www.Amidakurd.net/ku/tekst/R_ÊJÎMA_BAASÎ_YA_SÛRÎYAYÊ_K_ET_EV_DAWÎ_BÛ_AN_DESTPÊK_A_NÛ

[14] https://www.youtube.com/watch?v=IJy-oX0_pPs

[15] https://www.youtube.com/watch?v=czSPMGQIxYo

[16] https://youtu.be/czSPMGQIxYo?si =Ce0bNMiS5s8yNwUM